# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :975 | 29-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/



Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165


## Qelûn û destikên kêran yên Mam Yûsiv

**Mam Yûsiv Qasim, ev 32 sal in ku bênavber bi hunerê destan re mijûl e. Wî çandeke resen ya berê parastiye û heta îro aniye.**

Mam Yûsif Qasim, ev 32 sal in ku bê navber bi hunerê destan re mijûl e. Wî çandeke resen a berê parastiye û heta îro aniye. Bi çend amûrên piçûk û kevnar ji texteyan qelûn û destikên kêran çêdike. Mam Yusif dibêje: "Ji salên 90'î ve ez vî karî dikim. Ez bi vî karî xwe rehet hîs dikim û dema xwe bi çêkirina van destik û qelûnan derbas dikim."

dike, ez jî bi vî awayî diyariyan çêdikim ji hevalên xwe re."

Mam Yûsif bi xwe behsa amûrên li ber destê xwe dike: "Navê vê amûrê mengene ye. Mengene têxteyên ku li ser dixebitim, dijidîne û nahêle bileqe. Her wiha miberdên min ji hene ku ez bi wan texteyan nerm û rast dikim. Bi tevşo jî şiklên nû çêdikim li ser texte. Wekî din li gorî pêdiviyan ez mezrefe jî bi kar tînim."

Berê di çanda Kurdan de qelûn û darçixare girîng bûn û gelek



Mam Yûsif bi xwe 52 salî ye û li li gundê Kolka yê çiyayên Şengalê dimîne. Mam Yûsif piştî fermanê jiyana xwe bi keda destê xwe ji nûve ava kiriye. Kesên derûdorê ji karên wî hez dikin. Ked û hunerê wî bala me jî kişand û me xwest em wî nas bikin. Dema em çûn serdana wî, li ber destê wî karek hebû û darikek dixeritand û di ber re ji me re got, "Ev karê ku niha dikim karekî gelek kevnar e. Ji ber pêşketina amûrên nû yên hêsan, kîm kes êdî bi van malzemeyan kar dikin. Kes xwe nade ber karên wiha. Ev kar min rehet

kesan cixare bê darçixare ne dibir ber lêva xwe. Lê îro tenê kalemêr bi kar tînin, ew jî ji ber ku destê wan diricife û baş nikarin bi cixarê bigirin qelûnê tercîh dikin. Jixwe, Mam Yûsif jî dibêje, tenê niha bala kalemêran dikişînin ev qelûn. Mam Yûsif rojê du sê saetan bi vî kari re mijûl e. Hêri zêde qelûn û destikên kêran çêdike. Ji bo qelûn û destikekî dikare 2 saetan mijûl bibe. Ji bo qelûnan dibêje, ew karekî gelek zehmet e, lê ew dîsa jî ji kesên dixwazin re çêdike.

***ROJNEWS***

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Aktîf (Fransî) | Çalak, bibandor, zindî, bi liv û tevger, şixulker. Kesê pir dixebite: Ev nivîskarekî aktîf e |
| Arşîv (Fransî) | 1. Cihê ku kovar, rojname, wêne û berhemên din tê de tên parastin. 2. Materyalên ku tên parastin. |
| Arkeolojî (Fransî) | Zanista kolanê, şûnwarnasî, vekolîna dîrokê bi riya tiştên ji serdemên berê ve di binê erdê de mayîn û pişt re hatîn dîtin. |
| Aktivîst (Fransî) | Çalakvan, çalakker. |
| Ekolojî (Fransî) | Şaxekî zanistê ku li ser têkiliya zindiyan hem ya di navbera wan de hem ya bi derdora xwe re hûrgiliyê dike. |
| Hevpar | Hevbeş, hevpişk, şerîke, şirket. |
| Hevkar | Şirîk, hevpişk, kesên bi hev re kar dikin. |
| Konsept (Fransî) | 1. Têgîn. 2. Têgihîştin, nêrîn, fikir. 3. Rêbaz. 4. Pergal. |
| Rêgeh. | Cihê ku rê tê re derbas dibe. |
| Siruşt. | Xweza, tebîet. |

## Li Amedê heybeta mûzîkê

**MA Musicê bernameya xwe ya ji bo salvegera yekê ya damezrandina Zarok Ma'yê eşkere kir. Zarok Ma par ji bo zarokên temenê wan di navbera 0-5 salan de hatibû avakirin.**

MA Musicê bernameya xwe ya ji bo yekemîn salvegera damezrandina Zarok Ma'yê eşkere kir. Zarok Ma par ji bo zarokên temenê wan di navbera 0-5 salan de hatibû avakirin.
MA Music dê di 29'ê Hezîranê de merasîma mezûnbûnê û destûrnameyê li dar bixe û di çarçoveya bernameya diyarkirî de hin atolyeyan û semîneran li dar bixe.

**Bernameya MA Mûzîkê wiha ye:**

- 29'ê Hezîranê: Li Akademeiya MA Musicê merasîma mezûnbûnê û destûrnameyê (19:00)
- 2'ê Tîrmehê: Bernameya mezûnbûnê ya Zarok Ma'yê û Dîwana Zarokan (18.00)
- 3'ê Tîrmehê: Konsera Koma Zarok MA û Orkestraya Rîtma Xwezayî ya Xwendekarên Akademiya Zarokan a MA Musicê (18.00)
- 6 û 7'ê Tîrmehê: Konsera Koma MA û Orkestraya Muzîk Malî ya Silêmaniyeyê (20:30)
- 2 û 7'ê Tîrmehê: Semînerên li ser muzîka Kurdî û atolyeyên ji bo Keman Viyolayê dê bên lidarxistin.

***MA/AMED***



## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | S | A | M | Î | ■ | P | Z | ■ | N |
| 2 | S | ■ | I | N | T | ■ | O | T | O |
| 3 | ■ | O | X | ■ | R | E | N | Î | ■ |
| 4 | A | ■ | Î | Z | ■ | N | A | ■ | N |
| 5 | B | A | ■ | A | L | Î | ■ | X | E |
| 6 | ■ | B | E | L | Ê | ■ | Ê | ■ | H |
| 7 | Ş | O | M | ■ | Z | Ê | M | A | R |
| 8 | A | R | ■ | H | I | Ş | ■ | J | Î |
| 9 | M | ■ | L | A | M | ■ | L | O | ■ |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | | ■ | | | | | |
| 2 | | | | | | | ■ | | |
| 3 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 4 | ■ | | | ■ | | | ■ | | ■ |
| 5 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 6 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 7 | ■ | | | ■ | | | | ■ | |
| 8 | | ■ | | | | | | | ■ |
| 9 | | | | ■ | | ■ | | | |

### ÇEP-RAST

1. Kurtebêja Antîmonê... Temaşevan
2. Nasnavê ku berê didan fermandarê kazakên rûs... Notayek
3. Notayek... Nexweşiyek... Keriyê mî û bizinan
4. Peyva neyînî... Di zimanê zarokan de lêxistin
5. Cureyekî xwînê... Cihê herandinê... Cihê ku çûk û teyr xwe lê datînin
6. Lixwekirina piyan... Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd.
7. Sendîkaya Karkeran a Swêdê... Cephe, bere
8. Armanc, hedef
9. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Xweliya piştî şewatê

### JOR-JÊR

1. Agir... Kurtebêja Zîvê... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?
2. Bajarekî Tirkiyeyê
3. Tevgera hewayê... Paytexta Îtalyayê
4. Pirç... Tîpên navîn ê "saet"ê
5. Bayê rojhilatê... Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe
6. Rojek... Bi erebî "ez"
7. Pêxemberek
8. Bajarekî me... Plakaya navneteweyî ya Tirkiyeyê
9. Sir, tiştê her kes pê nizane... Rengek

## Nûrî Mehmûd: Divê civata navneteweyî hevkariya dewleta tirkî ya bi DAIŞ'ê re bibîne

Nûrî Mehmûd hişyarî da ku gefên dewleta Tirkan yên li ser bakur û rojhilatê Sûriyê, DAIŞ`ê vedijîne û got, ya balkêş, di her gefa dewleta de tevgera çeteyên DAIŞ'ê zêde dibe. Nûrî Mehmûd teqez kir ku çeteyên DAIŞ'ê ji herêmên dagîrkirî û çolistana Sûriyê derbasî herêmê dibin. ***R-5***




# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 975 | 29-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/


# `EV ŞER SERKEFTINÊ HEQ DIKE`

KJK'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku li hemberî balafiran, êrîşên dronên biçek û êrişên nûkleer yên kîmyayî ku dewletên mezin jî mehekê nikarîn li ber xwe bidin, gerîlayên YJA/STAR û HPG'ê bi hêzeke mezin ya berxwedanê bersiv dane êrîşan. KJK'ê herwiha çalakiyên gel û jinan yên li her derê yên ji bo gerîla, bi taybetî meşa dawî ya Dusseldorfê silav kirin. KJK'ê herwiha banga, "Em banga xurtkirina têkoşîneke wisa dikin ku dijmin biqede."kir ***R-3***





## `Şehîd Zîlan bûye nasname û bixwebaweriya tevayiya jinan`



Bi pêmana salvegera şehadeta Şehîd Zîlan endama Akademiya Jineolojî Şervîn Nûdem da zanîn ku çalakiya Şehîd Zîlan riya azadiyê ji tevayiya gelên bindest bi taybetî ji jinan re diyar kir. Herwiha got, yê ku bixwaze kesayeta zîlan di xwe de ava bike, pêwîst e di serî de fîkir û ramanê xwe pêş bixe. ***R-2***

## Evîndara welat û dayîka 4 cangoriyên azadiyê; Yadê Nofa

Şehîd Nofa Reşo (Yadê Nofa) yek ji wan dayîkan e ku nimûneya wam di dîrokê de kêm derbas dibe. Dayika Nofa ku tevî malbata xwe li Lubnan, Şam, Heleb û rojavayê Kurdistanê bûbû jêdera belavkirina fikrê Tevgera Rizgariya Kurdistanê, di salên 1980-1990`î de 4 zarokên xwe fedayî axa pîroz kirin û heta kêliya dawî ya jiyana xwe bi heskirin, wefedarî û fedekarî têkoşîn kir. ***R-6***




## Kampa Holê bombeyeke li ber teqînê ye




Civat û hêzên navneteweyî hê çareserkirina dosyaya çeteyên DAIŞ'ê yên di girtîgehên Rêveberiya Xweser û malbatên wan yên li Kampa Holê paşguh dikin. Rojbiroj sûcên kuştinê li kampê zêde dibin. Siyasetvan Mihemed Xelef li ser kombûna çeteyên DAIŞ'ê li cihekî bê ku werin cezakirin şiyarî da. ***R-5***

## Hêzên ewlekariyê encama hemleyên salekê yên têkoşîna li dijî narkotîkê eşkere kir

Hêzên Ewlekariya Hundir, madeyên narkotîkê ku di hemleyên xwe yên li dijî sûcan û narkotîkê de desteser kirine, telef kirin. Herwiha ragihandin ku li herêmê 570 kesên di bazirganiya narkotîkê de kar dikirin, girtine. ***R-3***



## Jiyaneke tijî huner: Hesen Zîrek



Hunermend Hesen Zîrek ku di serdemeke gelek zehmet de bi hunera xwe têkoşîneke mezin kir û bi stiranên xwe bû berdevkê êş û azarên gelê Kurd, hê jî bi deng û stiranên xwe olan dide. ***R-7***

## Jin û ciwan wê li hemberî dagîrkeriyê pêşengiyê bikin

Zekî Bedran *R-5*

## Piştî gefên dagîrkeran tevlêbûna jinên Çerkes, Tirkmen û Kurd

Her ku dewleta Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê gefan dixwin, bi ruhê seferberiyê ciwan pirtir berê xwe didin meclisên leşkerî yên bakur û rojhilatê Sûriyê. ***R-2***

## Jixwebawerî

Sîpan Şînda *R-7*

# `Şehîd Zîlan bûye nasname û bixwebaweriya tevayiya jinan`

Bi pêmana salvegera şehadeta Şehîd Zîlan endama Akademiya Jineolojî Şervîn Nûdem da zanîn ku çalakiya Şehîd Zîlan riya azadiyê ji tevayiya gelên bindest bi taybetî ji jinan re diyar kir. Herwiha got, yê ku bixwaze kesayeta zîlan di xwe de ava bike, pêwîst e di serî de fîkir û ramanê xwe pêş bixe.

**Darîn Silê/Qamişlo**

jinên Kurd ji bo destnîşankirina qedera xwe, xwe gihandine asta pêwîst ya xwebirêxistinkirinê. Herwih Ji bo parastina çand û nasnameya xwe bi hezaran jinan, bi ruhekî fedayî têkoşîna azadiyê kirine û li ser xeta rûmetê şehîd bûne.

**Azadî tim di hundirê jinê de veşartî ye**

Yek ji wan jinên leheng şehîd Zîlan (Zeyneb Kinaci) ye, ku bi lehengiya xwe bû sembola jiyana azad. Niha jî bi hezaran jinên Kurd û yên cîhanê bi navê wê bang dikin û bi ruhê wê yê berxwedêr li hemberî zihniyeta baviksalarî û desthilatdar disekinin. Şehîd Zîlana li hemberî zihniyeta dewleta desthilatdar sekinî, ji ber wê jî ruhê wê yê berxwedêr li tevahî gerdûnê belav bûye. Bi wî ruhê berxwedêr yê Zîlanan tevahî Jinên bindest berê xwe didin riya Azadiyê û Heqîqetê, da ku bibin şopdarên Sembola Berxwedanê. Şehîd Zîlan sala 1972`yan li bakurê Kurdistanê li gundê Almalî yê bajarê Meletî ji dayîk bûye. Zîlan beşa zanista derûnî ya zanîngeha Înonû qedandiye. Piştî wê tevlî Tevgera Rizgariya Kurdistanê dibe. Demeke kurt di nava tevgerê de xebatê dike û 30yê Hezîrana 1996`an li dijî êrişên dewleta tirkî yên hovane yên li ser gelê Kurd û hedefkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li Dêrsimê çalakiyeke fedayî pêk tîne. Di vê çalakiyê de dewleta tirkî windayiyên pir mezin dide. Herwiha li hemberî taktik û hêza jina Kurd ya têkoşer matmayî dimîne û dikeve nava şoqê.

Şehîd Zîlan xwedawenda jiyana azad e. Di roja me ya îro de bi hezaran jinan berê xwe daye wê riya ronahiya xwedawenda jiyana azad Zîlan. Da ku ew jî bibin şopdarên wê riya azadiyê ya ku Zîlan ji bo wê canê xwe fedayî gelê bindest û Rêberê mirovahiyê Abdullah Ocalan kir. Yek ji wan jinên şopdarên xeta zîlan, Endama Akademiya Jineolojî Şervîn Nûdem e, ku ji weltên derve hatiye li bakur û rojhilatê Sûriyê, li ser şopa Zîlanan têkoşînê dike û parastina riya azadiyê ya ku Zîlan afirandî dike. Şervîn derbarê çalakiya Şehîd Zîlan û fedekariya wê ya mezin, herwiha wateya çalakiya zîlan de ji me re axivî û nêrîna xwe anî ziman.

**`Şehîd Zîlan jiyaneke birûmet ji tevayiya gelên bindest re afirand`**

Şervîn Nûdem bi pêmana salvegera şhadeta Zîlan, tevayiya jinên berxwedêr û şoreşger bîr anî û wiha got: "Çalakiya Şehîd Zîlan tê wateya berxwedanke mezin li dijî komploya navnetewî û tevayiya kiryarên hovane yên li ser gelê Kurd. Zîlan bi çalakiya xwe ya fedayî jiyaneke birûmet ji bo tevayiya gelên bindest, bi taybetî ji bo jinan afirand. Niha jî em ruhê çalakiya Şehîd Zîlan di gelek jinan de dibînin. Ji bo wê jî wek jin dema em fikrê xwe pêş bixin û xwe bi rêxistin bikin em dikarin çalakiyên herî bibandor bikin. Em ji hevala Zîlan jî fêr bûne ku, em dikarin tevayiya êrişên ku ser jiyan û hebûna me tên kirin bêbandor bikin. Ji bo ku em wek Zîlan xwedîdîrokeke bi nirx û bandor bin, pêwîst e em fikrê xwe pêş bixin. Lewra hêza me ya fîzîkî û teknîkî tenê têrê nake. Ya esasî ew e ku fîkir û ramanê me pêşketî be."

**`Em hêz û moralê xwe ji kesayeta Zîlan digirin`**

Şervîn da zanîn ku sekna Zîlan ji bo her jinê xwedîwateyeke pir mezin e û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Zîlan tevayiya zincîrên koledariyê û lewazbûna ku dixwestin di jinê de biçînin şkandin.



Herwiha dema ku em nameyên şehîd Zîlan dixwînin em dibînin ku, wê azadiya jinê û Kurdistanê wek dozeke girêdayî hev digirt dest. Heman demê jî hêz û moralê di nameyên Şehîd Zîlan de, bûye pêşengiya gerîla, gel û tevayiya jinan. Çimkî di kesayeta wê û di nameyên wê de fikir û ramanê Rêber Apo tê dîtin. Ji bo wê jî wek jin em hêz û moralê xwe ji kesayeta wê digirin û dibêjin, ya bixwaze kesayeteke wek Zîlan di xwe de ava bike di serî de bila nameyên wê bixwîne."

**`Çalakiya Zîlan bû bingehê avakirina artêşa jinê`**

Şervîn diyar kir ku Zîlan bi çalakiya xwe ya fedayî hêz û îradeya jinê da xuyakirin û wiha pê de çû: "Çalakiya Zîlan wek çalakiyeke jiyanê tê pênasekirin. Heriwha bûye nasname û bixwebaweriya



rêxistinbûna tevayiya jinan. Zîlan bi çalakiya xwe derbeke mezin li dewleta tirkî ya dagîrker xist û zihniyet û hişmendiya ku li hemberî jinê dihat meşandin lewaz kir. Ji bo wê jî em dikarin bêjin, ku çalakiya wê bû bingehê avakirina artêşa jinê."

**`Nameya Zîlan ruhê berxwedanê diyar dike`**

Endama Akademiya Jineolojî Şervîn Nûdem di dawiyê de got, çalakiya Zîlan pêngaveke mezin di dîroka azadiya jinê de ye û ev li axaftina xwe zêde kir: "Nameya Zîlan gihiştiye tevayiya jinên cîhanê. Ev name bûye çavkaniya parastin û avakirina jiyaneke azad. Jinên ji welatên cuda dema nameya wê dixwînin ruhê berxwedanê hus dikin. Di roja me ya îro de jî gelek jin mîrasa wê diparêzin û têkoşînê xurttir dikin. Pêwîst e em peyama Şehîd Zîlan baştir nas fêm bikin û bighînin tevayiya jinan. Bi taybetî jinên ku hêviya xwe ya jiyanê winda kirine û yên di malê û zindanan de dîl girtî ne."

# Piştî gefên dagîrkeran tevlêbûna jinên Çerkes, Tirkmen û Kurd

**Her ku dewleta Tirkan ya dagirker û çeteyên wê gefan dixwin, bi ruhê seferberiyê ciwan berê xwe didin meclisên leşkerî yên bakur û rojhilatê Sûriyê.**

Şervanên bi navê Tesnîm Yaqûb, Agirî Kobanê û Hîem Emîn Mûsa ku ji pêkhateyên Çerkes, Tirmen û Kurd in, di pêvajoya gefxwarina dagirkeran de ji bo parastina xaka xwe tev li Meclisa Leşkerî ya Minbicê bûne. Piştî perwerdeyê niha amade ne ku welatê xwe ji dagirkeran biparêzin.

Tesnîm Yaqûb ku şervaneke Çerkes e, sala borî piştî dewleta Tirk dîsa li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê gef xwarin tev li Meclisa Leşkerî ya Minbicê bû. Tesnîm Yaqûb tîne ser ziman ku di nav meclisên leşkerî de hejmara jinên Çerkes kêm e ku ew jî bi israra xwe tev li bûye.

**Bandorê li birayên xwe jî dike û ew jî tev lê dibin**

Piştî ku şervan Tesnîm Yaqûb, tev lê dibe, 2 birayên wê bi navê Kendal Çerkes, Hesen Yaqûb jî tev li Meclisa Leşkerî ya Minbicê dibin.

Tesnîm Yaqûb dibêje bi tevlêbûna wê re gelek guhertin di jiyana wê de çêbûye û behsa meclisê dike: "Di nava vê meclisa leşkerî de min hemû pêkhate dîtin. Hemû reng di meclisê de hene. Ev cudabûna rengan hev temam dikin. Dema



gel jî vê dibîne, ew jî hevgirtî dibe ku zarokên wan di nava vê meclisê de ne. Hevgirtina gel li Minbicê hêzêke xurt ava kiriye. Ji tunebûnê hebûn hat avakirin."

**Bi banga seferberiyê re tev lê bû**

Hîem Emîn Mûsa ku ji pêkhateya Tirkmen e, piştî gefên dagirkeran yên îsal tev li Meclisa Leşkerî ya Minbicê bûye. Hîem Mûsa dibêje ji bo azadiyê jinan mîsoger bike û li dijî gefan bi sekneke xurt bisekine, tev lê bûye û van lê zêde dike: "Şervanan bandor li min kir ku ji bo azadî û parastina welatê me şer dikin.

**`Bi qasî navê xwe agir bi dijmin bixim`**

Agirî Kobanê ku ji Kobanê ye û berê di nav Hêzên Ewlekariya Hundirîn de cih digirt, niha jî wekî hevalên xwe tev li Meclisa Leşkerî ya Minbicê bûye. Agirî Kobanê tîne ser ziman ku li dijî gefên dewleta Tirk a dagirker piştî ku seferberî hat ragihandin, tev li meclisa leşkerî bûye û dibejê: "Ger ez welatê xwe neparêzim dê kî biparêze? Min navê xwe kir Agirî ku bi qasî navê xwe agir bi dijmin bixim. Heya dilopek xwîn bi me re hebe em ê li dijî dagirkeran li ber xwe bidin û nahêlin derbasî axa me bibin. Dagirker dixwazin Minbicê dagir bike ku ji Minbicê êrişî her cihî bike. Lê em nahêlin ev pêk were. Xewnên wan dê tenê di xewnan de bimîne."

Agirî Kobanê bang li ciwanan kir ku tev li hêzên xwe bibin û li dijî dagirkeran bi yekdestî rabin û got: "Ji bo ku dîsa pêvajoya DAIŞ'ê dubare nebe divê her kes banga seferberiyê pêk bîne."

***ANHA***



# Jiyaneke tijî huner: Hesen Zîrek

Hunermend Hesen Zîrek ku di serdemeke gelek zehmet de bi hunera xwe têkoşîneke mezin kir û bi stiranên xwe bû berdevkê êş û azarên gelê Kurd, hê jî bi deng û stiranên xwe olan dide.

Di dîroka mirovahiyê de ji berhemên mayinde yên di dest civakan de dimînin hin jê yên çandî û hunerî ne. Ev berhemên mayinde di gelek waran de reng û dengê civaka xwe di xwe de dihewînin. Di civaka Kurdî de jî ji hunermendên ku bi dengê xwe û stranên xwe bûne berdevkê êş, azar, şahî û xweşiyên civaka xwe yek jê jî Hesen Zîrek e. Çendî di ser koçkirina wî re 50 sal derbas bûbin jî, lê hê jî bi stranên xwe olan dide.

Hunermend Hesen Zîrek, di sala 1921'ê de li gundê Hermêlê yê Bokan a Rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. Gava hê biçûk bûye bavê wî miriye. Piştî dêya wî dizewice, ji bêgavî ji gundê xwe dûr dikeve. Zîrek di 12 saliya xwe de terka Bokanê kiriye û çûye bajarê Seqizê. Di 15 saliya xwe de dîsa vegeriyaye Bokanê, lê vê carê li wir pir nemaye û ji bo ji xwe re karekî peyde bike çûye Tewrêz û Tehranê. Di vê navê re Zîrek gelek zor û zehmetî kişandine. Di gelek karan de xebitiye. Hema bibêje tu kar nemaye nekiriye. Zîrek di xortaniya xwe de ji karkerî û şivantiyê bigire di gelek karan de şixuliye. Piştî demekê ji Tewrêzê berê xwe daye Başûrê Kurdistanê. Li wir li bajarê Silêmaniyê li taxa Dergezên bi cih û war bûye. Her wiha demekê bûye mêvanê Kerkûkê jî.

**Tûrikê muzîka kurdî**

Zîrek axirê di sala 1953'yan de berê xwe daye Radyoya Bexdayê ya Kurdî. Li vir gelek stranên berê yên Kurdî li gel Orkestraya Radyoya Bexdayê qeyd kirine. Hesen Zîrek, di 14'ê Tebaxa 1959'an de, li ser daxwaza Radyoya Kurdî ya Tehranê vegeriyaye Îranê û li gel orkestrayên cur bi cur li Tehranê di warê muzîka Kurdî de xebitiye. Her wiha carinan li Azerbeycanê di Radyoya Tewrêzê de jî stran gotine. Bi dû re di sala 1960'î de çûye Kirmaşanê û piraniya karên xwe yên hunerî li gel Orkestraya Radyoya Kirmaşanê bi rêberiya hunermendê mezin Mucteba Mîrzade qeyd kirine ku nav û dengê hunera wî bi piranî ji ber vê yekê belav bûye. Lewre ew stranên ku wî ew li wir kom kirine wekî şakarên hunera wî têne zanîn.

Hesen Zîrek piraniya stranên xwe bi zaravayê Soranî gotine, lê carinan bi zaravayên din ên zimanê Kurdî jî gotine. Her wiha bi zimanê Farisî û Tirkî jî stran gotine û heta radeyekê bi zimanê Erebî jî zanibûye.

**Xwe li çiyê girtiye**

Zîrek di havîna sala 1968'an de li nêzîkî bajarê Baneyê li 'Kanî Mela Ehmed'ê çayxaneyek ava kiriye û tê de xebitiye. Wê çaxê ew û hevsera xwe ya nû Rabieyê bi hev re bûne. Lê jiyana wan, jiyaneke bargiran bûye. Zîrek di kaseteke xwe de ku li Kanî Mela Ehmedê tomar kiriye dibêje: "Ez li vir li ser çiyayekî dijîm, çimkî li Îran û Iraqê cihek tune ye ku ez lê bijîm. Di navbera çend keviran de, min çayxaneyeke ne xweş heye. Heke hûn bên û bibînin, hûn ê ecêbmayî bimînin ku ez çawa li vir dijîm! Na, bi min xweş e û ez debara xwe pê dikim. Ji ber ku di nava gelê Kurd de qedr û qîmeta hunerê nema, hunerê tu fêde neda min. Hunerê ji min re tiştek nekir ku ez bi dûv wê bikevim. Ji ber ku ez Kurd im û bi zimanê Kurdî diaxivim."

Ji ber hin sedeman Hesen Zîrek li Baneyê hew debar kiriye û berê xwe daye Mehabadê. Li wir jî ji ber stranên xwe bûye hedefa êrîşên polîsan. Ji vir jî bar kiriye û vê carê çûye Şinoyê.

Hunermendê gel

Hesen Zîrek li gelek gund, navçe û bajarên Kurdistanê geriyaye; bi çavên xwe bûye şahidê êş û zehmetiyên gelê Kurd. Wê êş û xwezaya Kurdistanê û her wiha rojên neteweyî yên Kurdan bi stranan aniye ziman. Zîrek reseniya Kurdî parastiye û ji her kesî re stran gotine. Lewma tevahiya gelê Kurd ji dengê Hesen Zîrek hez dike û guh lê dike.

**Hezar û 500 berhem**

Hesen Zîrek di tevahiya



temenê xwe de, hezar û 500 stran tomar kirine. Her wiha gelek helbestên helbestvanên wekî Nalî, Wefayî, Seyîd Kamil, Îmamî, Kurdî, Pîremêrd, Hêmin, Tahir Beg Caf vehûnandine û kirine stran. Sirûda bi navê 'Newroz'ê ku li çar parçeyên Kurdistanê li ser zimana ye û helbesta Pîremêrd e, yek ji berhemên wî yên herî bi nav û deng e.

**Zîrek bû ruh, pîremêrd jî agırê newrozê geş kır**

Newrozê mizgîniya biharê ye, bi awayekî dîtir germahiya dilê mirovan zêde dibe û dike ku mirov li hev bicivin. Lê Newroz ji bo Kurdan ne civîneke ji rêzê ye, sembola daxwazên siyasî û serhildana gelê Kurd e. Ji salên 1950'yî ve bûye şahî û pîrozbahiya gelê Kurd.

Demekê li Silêmaniyê Pîremêrd serkêşiya vê yekê dike û ev pêvajo heya salên 1970'yî berdewam e. Lê di wan deman de dengekî nemir bilind dibû û hatina Newrozê bi rêya Radyoya Kirmaşan û Tehranê pîroz dikir. Helbet ev dengê hêja dengê Hesen Zîrek bû ku ruh dida helbesta Pîremêrdê ku agirê Newrozê geş dikir.

Hesen Zîrek, di 26'ê Hezîrana 1972'yan de, di 51 saliya xwe da li bajarê Bokanê xatir ji mirov û dilxwazên xwe xwestiye û çûye ser dilovaniya xwe. Wî li dû xwe arşîveke hunerî ya têr û tije ji bo neteweya xwe hiştiye ku bûye çavkaniyeke dewlemend ji bo hunera xwerû û resen a Kurdî. Hesen Zîrek stranbêjê herî xebatkar ê Kurdan e ku bi sedan stran di radyo û televîzyonan de dane qeydkirin.

Di nav stranên Hesen Zîrek de ya herî bi wate û navdar "Ey Niştiman"e. Zîrek vê stranê di sala 1946'an de li ser Komara Kurdistanê (Mehabad) çêkiriye û li bara civaka Kurdî wekî sirûdekê tê pejirandin. Lewre dema ku Zîrek çûye Mehabadê pêvajo pêvajoya Şerê Cîhanê yê Duyemîn bûye û Îngilistan û Yekitiya Sovyetan li Îranê dixistin. Di wê navberê de bi pêşengiya Qazî Mihemed jî Komara Kurdistanê ava dibû ku piştî 11 mehan komar hat hilweşandin û Qazî Mihemmed û hevalên xwe li Qada Çarçirayê hatin darvekirin. Ev yek bandoreke gelekî mezin li Hesen Zîrek kiriye. Zîrek li ser vê rewşê gelek berhemên giranbuha afirandiye.

Lê belê di sala 1974'an de Esîn Engîn ê ji malbateke Tetar vê stran û sirûda Kurdî ya Hesen Zîrek wekî "Ankaranin Taşina Bak" guherandiye. Bi dû re Rûhî Sû û Zulfu Lîvanelî jî di nav de gelek hunermendên Tirk gotinên vê stranê guherandine. Ev yek jî balê dikişîne ser salên 1920'an ên Tirkiyeyê.

**Hê jî olan dide**

Hunermendê nemir berî biçe ser dilovaniya xwe xwestiye ku wî li Çiyayê Naleşikên veşêrin û li ser kêlika wî wiha were nivîsandin:

"Zîrek zor kird xizmetî huner
Jînit le pênaw huner birde ser
Rojgarit satê be bêxem nebû
Belam le huner hîçit kem nebû."

Hunermend Hesen Zîrek li dû xwe komeke stranên nemir hiştin û ji vê dinyayê koç kir. Her çiqasî ji koç kiribe jî, lê hîna jî bi dengê xwe û stranên xwe olan dide.

Niha piraniya berhemên Hesen Zîrek di arşîva enstîtuyên Kurdî û Ereb û Farisan de hatine hilanîn. Stranên Zîrek ên li enstîtuyên Kurdî li benda rêzealbûmê ne.

***ROJNES***



**Jixwebawerî**

Sîpan Şînda

Jixwebawerî, serwextiya mirovî ya derbarê jêhatîbînî, zîrekî, fêhmayî û destûçeniyên mirovî bixwe de ye. Ev serwextî sekna mirovî ya di jiyanê de diyar dike. Ne tenê sekna mirovî, herwiha paşroja mirovî jî di asteke bilind de diyar dike. Heyîna wê ji bo mirovan zêdahiyek gelekî berketî ye.

Kesên jixwebawer, di jiyanê de pirtir erênî ne. Nêrîna wan ya li ser jiyanê û bûyeran ji ya kesên din cudatir e. Ew kes di jiyanê de serkeftîtir û bistetir in. Pirtir dikarin biryaran bi serê xwe bistînin û zêde di bin bandora derdora xwe de namînin. Çi di warê kar de be, çi di têkiliyên civakî de be, çi di têkiliyên jin û mêrantiyê de pirtir dikarin bi awayekî serbixwetir biryaran bidin. Dema biryarekê didine yan jî dema dixwazin tiştekê bikine bi serê xwe biryara xwe didin û berpirsyariya wê ji digirin ser xwe. Di biryarên xwe de zêde nakokiyan najîne û di kiryarên xwe de bizirav in. Pirrê caran hewce nabînin ku derbarê kar û biryarên xwe de pirsa xwe ji keseke din bikin. Heke vê bikin jî ji bo biryareke baştir bidin dikin. Dema ew di karê xwe de jî bi ser neketin, vê weke dawiya dinyayê nabînin û dibêjin divê ez careke din jî biceribînim. Ew girêdayî armanca xwe ne û bi biryar in. Hêrsa wan ya serkeftinê zêde ye û zêde ji xwe re hêcetan çênakin. Lê dema bi ser jî nekevin lê nagerin ku sûcdarekê bibînin. Ew dibêjin min kir û vê carê çênebû, lêbelê wê careke din çêbe. Bi taybetî di warê kar de bi awayekî erênî nêzîkî karê xwe dibin.

Mirovên jixwebawer ji rexneyan re vekirî ne. Dikarin rexneyên derdorê qebûl bikine û wan weke qitîskên pêşiya wan ronî dikin ji xwe re dibînin. Ew li ser xwe mikur tên û dixwazin bizanin ka wan di kû de kêmasî kirine. Taybetmendiya wan yêk jê ew e ku her tim xwe pêş de dibin û ji tiştên nû re vekirî ne. Dikarin xwe li gorî şertên jiyanê eyar bikin. Jiyanê li ber çavên xwe reş nakin. Ew aliyên xwe yên xurt û zeîf dizanin. Dema bi mirovan re dikevine nava peywendiyê jixwebawer in û bi awayekî realîst nêzîkî meselan dibin. Ew baweriyê didin derdora xwe. Ew xwe bi kesên din re zû bi zû nadin ber hev û ew ne li gorî serkeftinên kesên din xwe eyar dikin. Jixwe danaberheva bi kesên din re dibe ku ji bo wan bandoreke neyînî bike û wan ji armanca wan dûr bixe. Ew bi ti kesî re ne di nava pêşbirkê de ne, ew tenê bi xwe re di nava pêşbirkê de ne. Ew ne hesûd in û keyfa wan ji serkeftina mirovên din re jî tê. Ew dibêjin dibe ku serkeftina hineke din roniyê bide derdora wan û hineke din jî sûdê ji wan bigirin û pirtir li ser karê xwe bisekinin û girêdayî armancên xwe bibin. Ew qedrê xwe digirin û cil û bergên herî baş layiqê xwe dibînin. Felsefa wan ya jiyanê, dibêjin ez carekê tême vê dinyayê û divê heta ku ji min bê ez baş bijîm. Herweha girîngiyê didin tenduristiya xwe û ji jiyanê hes dikin. Kesên jixwebawer ji axaftinên neyînî dûr in û her tim erênî diaxivin.

Bi kurtayî, kesên jixwebawer di jiyanê de erênî ne û dizanin çi ji jiyanê bixwazin û çi jê nexwazin.

# Evîndara welat û dayika 4 cangoriyên azadiyê; Yadê Nofa

Şehîd Nofa Reşo (Yadê Nofa) yek ji wan dayîkan e ku nimûneya wan di dîrokê de kêm derbas dibe. Dayîka Nofa ku tevî malbata xwe li Lubnan, Şam, Heleb û rojavayê Kurdistanê bûbû jêdera belavkirina fikrê Tevgera Rizgariya Kurdistanê, di salên 1980-1990`î de 4 zarokên xwe fedayî axa pîroz kirin û heta kêliya dawî ya jiyana xwe bi heskirin, wefedarî û fedekarî têkoşîn kir.

Di dîroka gelan de, kêm caran dayikan xuliqkarî, moral, hez û pêkanîna karekî bi wate û bi nirx kirine xizmeta doza welatên xwe. Yek ji deverên ku nimûneyên dayikên berxwedêr lê tên peydakirin jî, Kurdistan e.

Ji ber zilm, talan û qirkirina ku li hemberî gelê Kurd tê kirin, herî zêde dayikên Kurd bi hîs û hêza xwe dibin xwediyên para mezin a avakirina şoreşgeran, dayîna hêzê û bandorkirina li civakan û perwerdekirina nifşên nû li ser hezkirina welat.

Yadê Nofa yek ji nimûneyên dayikên Kurdistanê ye ku bi fedakariya xwe bûbû jêdera belavkirina dengê tevgera azadiyê li Lubnan, Şam, Heleb û Rojavayê Kurdistanê. Her wiha di nava Tevgera Rizgariya Kurdistanê de kedeke mezin da û 4 lawên xwe di salên 1980-1990`î de fedayî axa pîroz kirin.

### Yadê Nofa kî ye?

Nofa Îsmaîl Reşo bi nasnav "Yadê Nofa" di sala 1940`î de li Lubnanê tê dinê, piştre tevî dayik û bavê xwe vedigere gundê pêşiyên xwe gundê Hecî Nasir ê girêdayî navçeya Amûdê ya Qamişlo. Piştî zewacê careke din diçe Lubnanê li wir 9 zarokên wê çêdibin; 3 keç û 6 kur.
Di salên 1970`î de Yadê Nofa tevî malbata xwe dîsa berê xwe dide Rojavayê welat û li bajarê Qamişlo bi cih dibe, lê kurê wê yê mezin ji bo kar li Lubnanê dimîne.

### Nsdlotoms Rêber Ocalan

Rojekê ji rojên 1979`an, dema Yadê Nofa sardana kurê xwe yê li Lubnanê dike, bi rêya mirovê xwe Rêber Abdullah Ocalan dibîne, ew dem jî dema avakirina Akademiya Şehîd Mahsum Korkmaz bû.
Keça Yadê Nofa, Semîra Hemdîn li ser hevdîtina dayika xwe bi rêber Ocalan re dibêje ku beriya dîtina rêber Ocalan dayika wê heyrana Kurdistanê bû û wiha pê de çû: "Piştî dîtina rêber Ocalan dayika min digot serok Apo dikare hebûna welat misoger bike. Wekî mirovekê bibêje ez li kesayeteke wiha digeriyam ku rê ji min re nîşan bide. Bi wê re xwesteka dayika min a têkoşîna ji bo Tevgera Rizgariya Kurdistanê çêdibe."

Yadê Nofa di dirêjahiya kar û xebatên xwe yên di nava tevgera azadiyê de, gelek caran rêber Abdullah Ocalan dibîne, di navbera wan de hevaltiyeke giranbuha çêdibe. Piştî hevdîtinên bi rêber Ocalan re ji zarokên xwe re her behsa heybetmendî û kesayeta rêber Ocalan dikir. Keça wê Semîra got: "Diya min digot ne bi destê rêber Ocalan be, em welat nabînin. Rêvebertî bi zanebûnekê ev partî ava kiriye." Bi naskirina rêber Ocalan, mîna ku Yadê Nofa di jiyana xwe de li tiştekî digeriya û dît. Ji ber vê yekê kesayet, malbat û mala xwe li ser fikr û ramanên rêber Ocalan bi rêxistin kir. Yadê Nofa ne tenê di oxira welat de zarokên xwe şehîd dane, her wiha nêzî 8 zarokên şehîdan xwedî kirine. Hezkirina Yadê Nofa tenê ji neteweya Kurd re sînordar nema, beşeke ji hezkirinê di nava jiyanê de diyarî pêkhate û olên din jî kir. Jêdera vê hezkirinê fikrê rêber Ocalan e, ku li Lubnanê tevgera azadiyê bi hejmareke malbatên Xiristiyan da nasandin.

### Ji malbata yadê nofa 4 pakrewan



Ji ber têkoşîna Yadê Nofa ya di nava Tevgera Rizgariya Kurdistanê de, zarokên wê jî li gorî pêwîstiya welat bûn şoreşgerên xwedî li fikrê rêber Ocalan derdikevin. Ji malbata Yadê Nofa 4 cangorî hene.
Şehîdê yekemîn, kurê wê Semîr Hemdîn (Ehmed) e, ku li Akademiya Şehîd li Lubnanê di sala 1985`an de şehîd dibe. Piştî şehadeta kurê yekemîn, kurê wê yê din jî Mistefa Hemdîn (Xeyrî) jî tev li nava refê gerîla dibe, ew jî di sala 1988`an li çiyayê Kurdistanê şehîd dibe.

Piştî ku du kurên yadê Nofa tev li karwanê şehîdan dibin, kurekî wê yê din jî Îsam Hemdîn (Selman) çeka her du birayên xwe radike û tev li gerîla dibe. Selman di sala 1990`î de li çiyayên Kurdistanê şehîd dibe.

Kurê herî biçûk
û delaliyê malbatê jî yê bi navê Enwer Hemdîn (Orhan) doza gelê Kurd û şehadeta her 3 birayên xwe ji bîra xwe nabe, ew jî dide dû şopa wan û tev li rêfên gerîlayên azadiya Kurdistanê dibe. Keça Yadê Nofa wê demê bi bîr tîne û wiha vedibêje: "Wê demê rêber Ocalan ji Orhan re got, em naxwazin tu biçî, li cem yadê bimîne, ji ber ku 3 birayên te şehîd bûne. Orhan ji rêbertî re got 'welatê me ye, ji mafê me ye em tev li parastina wê bibin'." Orhan jî di sala 1994`an de derbasî nava refên şehîdên salên 1990`î de dibe.

### Hewldanên girtina wê jî nedighştin serî

Bi şehadeta her 4 kurên Yadê Nofa asta têkoşîn û berxwedana wê bilindtir dibe, ji ber têkoşîna wê ew gelek caran rastî hewldanên girtinê ji aliyê leşkerên rêjîma Baasê ve hatiye. Lê Yadê Nofa bi zîrekiya xwe, xwe bi destê wan nedixist. Di merasîma kurên wê de gel ji seranserî Rojavayê Kurdistanê berê xwe dide mala Yadê Nofa, ew jî dihêle ku Yadê Nofa bibe hedefa rêjîma Baasê, lê dîsa jî bi vîna xwe, xwe radestî wan nedikir.

Yadê Nofa bi nêrîneke ku dê rizgarkirin û azadkirina Kurdistanê ji çiyayên Kurdistanê û Herêmên Parastinê yên Medyayê dest pê bike, şoreşgerên Tevgera Rizgariya Kurdistanê mîna parçeyekî canê xwe didîtin.

### 'Belavbûna fikrê rêber ocalan, planên wan têk birin'

Her kersê/a ji rêber Ocalan hez dike, di dema dîlgirtina rêber Ocalan de bi hêrs dibe û şînê digerîne, lê ji ber nêzîkatiya di navbera Yadê Nofa û rêber Ocalan de, birîna Yadê Nofa kûrtir bû û digihêje wê astê ku nexweş dibe û dikeve nava livînan.
Keça wê Semîra Hemdîn têkildarî vê yekê got: "Dayika min digot `Bila nebêjin bi girtina serok Apo, em ê dûrî karê xwe bikevin, fikrê serok belav bûye, hemû planên wan jî rê li pêşî bigirin `. Rêber Apo jî bi pêxemberekî dida pênasekirin."

Piştî dîlgirtina rêber Ocalan Yadê Nofa karê xwe dewam dike, beriya Şoreşa Rojava bi çend salan ew dikeve xwarê û di lingê xwe de birîndar dibe û nikare wekî berê kar û xebat bimeşîne.

Bi destpêkirina Şoreşa 19`ê Tîrmehê re kêfxweşiyeke mezin dikeve dilê wê, tevî zehmetiya bi meşa li ser gopalan re jî, ew sardana saziyên şoreşê dike. Yek ji wan jî ya ragihandinê bû ku nêzî mala wê bû. Bi dîtina saziyan bêhna wê derdiket û li xweşiya wê dihat. Semîra, keça Yadê Nofa li ser vê yekê ev tişt got: "Dayika min digot `Şoreşa Rojava derfeteke binirx e, ne tenê ji bo kurdan lê ji bo hemû pêkhateyan e`."

Nofa Îsmaîl Reşo (Yadê Nofa) sala 2015`an di 71 saliya xwe de, ji ber krîza dil li bajarê Qamişlo koça dawî dike. Meclisa Malbatên Şehîdan a Qamişlo roja şemiyê (25`ê Hezîranê) meytê Nofa Îsmaîl Reşo ji Goristana Hilêliyê ya Qamişlo bi merasimekê bir Goristana Şehîd Delîl Saroxan.
***ANHA***

# Dewleta tirkî ya dagîrker daristanên bakur û başûrê Kurdistanê talan dike.

**Navenda nûçeyan**

**Rojane bi sedan ton darên daristanên bakur û başûrê Kurdistanê ji aliyê artêşa Tirkiyê ve tên birîn.**

Rojane bi sedan ton darên ku ji daristanên navçeyên Şirnexê yên Cudî û Besta û di nav sînorên Başûrê Kurdistanê de bi serkêşiya Artêşa Tirkiye ya dagîrker ji aliyê kompanyayên taybet ve tên birîn, bi barhilgiran ji daristanan tên veguhastin û bo parêzgehên din tên firotin. Çavkaniyên herêmî diyar kirin ku rojane herî kêm 10-15 barhilgirên daran ji daristanên bakurê Kurdistanê û beşeke zêde ya wan jî ji daristanên başûrê Kurdistanê bi vî awayî tên veguhastin, ku her yek ji wan dikare heta 10-15 ton daran hilgire.

Serokê Komisyona Jîngehê yê Baroya Şirnexê Fadil Tay jî diyar kir ku têkildarî mijarê di warê yasayî de çendîn caran gilî tomar kirine lê ti encam bi dest nexistine. Tay got, "Mixabin ev serê 2 salan e, çiyayên Kurdistanê bi taybetî Çiyayê Cûdî heta çiyayên Başûrê Kurdistanê dar û daristanên me tên jêkirin û talankirin."

Bi birîna daristanan ne tenê xwezaya herêmê zererê dibîne, ziyaneke zêde digihe hemû ajel û canewerên di nava daristanê de û beşeke zêde ya wan ji nav diçin. Serokê Komîsyona Jîngehê yê Baroya Şirnexê banga piştgiriyê li her kesî dike ku rê li ber zêdetir talanirina xwezay herêmê bê girtin.






# KJK: Ev şer teqez serkeftinê heq dike

## KJK'ê çalakiyên gerîlayên YJA/STAR û HPG'ê silav kirin û banga, "Em banga xurtkirina têkoşîneke wisa dikin ku dijmin biqede." kir.

**Navenda Nûçeyan**

KJK'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku li hemberî balafiran, êrîşên dronên bi çek û êrîşên nukleer ên kîmyewî yên ku dewletên mezin jî mehekê nekarîn li ber xwe bidin, gerîlayên YJA/STAR û HPG'ê bi hêzeke mezin a berxwedanê bersiv dane êrîşan. KJK'ê her wiha çalakiyên gel û jinan ên li her derê yên ji bo gerîla, bi taybetî meşa dawî ya Dusseldorfê jî silav kir.

KJK'ê got, "Di pêvajoyek wiha hesas de ne tenê piştgirîkirina gerîla, bi şêwaza tolhildana gerîla mezinkirina têkoşînê û gihiştina serkeftinê gelek girîng e." KJK'ê anî ziman ku şerê bi pêşengiya HPG û YJA/STAR'ê pêş dikeve serketineke teqez heq dike, mela Rêbertî ya pêncî salî di sala pêncî de serkeftinê heq dike, têkoşîna bi rûmet a jinan serkeftinê heq dike. Li ser vê bingehê em li ser xeta serkeftinê ya Rêber Apo, bi berxwedana gerîla û têkoşîna bi hêz ya jinan re bin û teqez em ê bi ser bikevin."

Peyama Komalên Jinên Kurdistanê (KJK) a ji bo gelê Kurd ê welatparêz, raya giştî ya demokratîk û ji bo hemû jinên azadîxwaz wisa ye

"Ber bi 30'ê Hezîrana 2022'an de, gerîlayên me li Zap, Avaşîn, Metîna, Botan û Amedê bi biryardarî li ber xwe didin û ji bo welatê xwe û azadiya xwe wek şehîd Zîlan bi awayek fedaî şer dikin û li hemberî dijmin dibin guloka ji agir. Gerîlayên ku di xeta Zîlan de dimeşin, bi xwebaweriyeke mezin bi ser pergala qirker û mêtinger û mirinê ve dimeşin û nemiriyê bi tîpên zêrîn li Kurdistan û dîroka mirovahiyê dinivîsin. Em şehîd Zîlan û rêhevalên xwe yên li her milekî xaka Kurdistanê şehîd bûne, şehîdên xwe yên ku bi têkbirina mirinê nemir bûne, bi hezkirin û rêzdarî bi bîr tînin û soz didin ku em ê pergala Îmraliyê hilweşînin û Kurdistana azad ava bikin. Afirandina serketinê yekane rêya layîqbûna van şehîdên mezin e.

### Em ji gerîla hêzê distînin

Li çiyayên Kurdistanê şerê herî dijwar ê dîrok û sedsala me diqewime. Gerîlayê Kurdistanê ku evîna welat di asta herî jor de dijîn, bi berxwedan û şerê xwe yê bi heybet di herikîna dîrokê de şopên nû û mezin dihêle, bîranîna azadiyê ya ku tê xwestin were tunekirin, bi ruhê mezin ê komînal zindî dike û mezin dike. Gerîlayê Kurdistanê ku di dilê xwe yê ciwan û fedakar de heqîqeteke mezin hildigire, bi şerê li Zap, Avaşîn û Metîna meşandiye, şêwaza gerîla ya sedsala 21'an bi awayekî herî xurt radixe ber çavan. Xeyalên Osmaniyan ên desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê li Zapê vediguherîne kabûsekê û planên wan yên nûjenkirina Lozanê di sala 100'emîn de serobin dike. Gerîla di 50'emîn salvegera tevgera me ya azadiyê de bi dil, mejî, şêwaz û fedakariyeke bêhempa polîtîkayên 100 salî yên mêtînger-qirker dişkîne. Balafira ku dewletên mezin jî nikarin mehekê li ber xwe bidin, bi hêza berxwedanê ya sermirovî bersivê dide êrîşên dronên bi çek û êrîşên nukleer ên kîmyewî. Em KJK gerîlayên YJA/STAR û HPG'ê yên ku di dîrokê de bûne mijarên vî şerê mezin silav dikin, diyar dikin ku em ji serkeftinên wan û ji her derbeya ku li dijmin dixin hêzeke mezin digirin û wan pîroz dikin.

Ev berxwedan û serkeftina mezin a gerîlayên me, careke din îspat dike ku hemû polîtîkayên dagirkeriyê îflas kiriye. Vejîna mezin a Kurd bi têkoşîna xwe ya hebûn û azadiyê re xwe gihand qonaxeke nû. Banga gerîlayên Kurdistanê ya ji bo leşkerên dijmin ên 'Werin teslîm bibin' û peyama 'Ev der Kurdistan e, têketin heye, derketin tune' li ser rastiyekê radiweste û dibêje, 'Du sed sal in. Polîtîkayên berê îflas in, êdî divê hûn vê biguherînin.' Divê êdî hêzên desthilatdar ên navneteweyî û herêmî vê rastiyê bibînin û bi tinehesibandina Kurdê azad polîtîkayên xwe yên li Kurdistanê ji nû ve diyar bikin. Dema mêtîngerî, polîtîkayên qirkirinê, îxanet û hevkariyê derbas bûye. Stratejiya me ya Kurdê azad û jina azad û israra me ya di vê stratejiyê de ji hemû polîtîkayên klasîk derbas kiriye. Ji xeynî bêhêvîtiyê ya ku ji aliyê dijmin û hêzên xayîn ve tê ferzkirin ne tiştekî din e

### Em çalakiyên gel û jinan silav dikin

Ya girîng ew e ku bi vê şerê bi hostatî û fedaî yê gerîlayên me yên gel û jinan, têkoşîna xwe ya li dijî faşîzm û mêtîngerî mezin bikin û dijmin bi tevahî dorpêç bikin. Di vê qonaxa dîrokî ya pir krîtîk de ne tenê piştgirîkirina gerîla, di heman demê de bi mezinkirina tolhildanê û balkişandina ser serkeftinê bi şêwazê gerîlatî, têkoşîna li dijî dijmin jî girîng e. Bi taybetî jî weke jin divê em hêzeke têkoşînê ya bi xwe bawer, rêxistinkirî û aktîf ku di asta herî jor de bersivê dide êrîşên qirker û zayendîparêz pêş bixin. Li hemû qadên Kurdistanê çalakiyên bi pêşengiya jinan pêş dikevin û ev gelekî watedar e. Li ser vê bingehê em çalakiyên gelê xwe û jinên li her derê yên ji bo gerîla bi taybet meşa dawî ya Dusseldorfê silav dikin. Divê em berdewamî û serdestiyeke ku van kiryaran derînin holê û dijmin bêçare bike ava bikin. Tenê bi vî awayî em dikarin layiqî berxwedana gerîlayên xwe û nemiriya şehîdên xwe bin. Peyama sereke ku şehîd didin me, li ser esasê berxwedan û serketinê ye.



### Ev şer teqez serkeftinê heq dike

Em KJK em bang li hemû gelê xwe, di serî de jin, ciwan, hemû pêkhateyên hestiyar û dostên xwe dikin ku têkoşîna heyî mezin bikin. Em bang dikin bi awayê ku wê dijminê neçar bûye nikaribe bêhna xwe jî bistîne, li her derê agirê têkoşînê geş bikin û di tarza ku wê dijmin biqede, em ê têkoşînê geş bikin. Ev şerê ku di pêşengtiya HPG û YJA/STAR'ê de pêş ket, serkeftina teqez heq dike, meşa Rêbertiyê ya 50 salî di sala xwe ya pêncî de serkeftinê heq dike, têkoşîna bi rûmet a jinan serkeftinê heq dike. Li ser vê bingehê em li ser xeta serketinê ya Rêber Apo, bi berxwedana gerîla û bi têkoşîna bi biryardarî ya jinan re bin û em ê teqez bi ser bikevin."

# Hêzên ewlekariyê encama hemleyên salekê yên têkoşîna li dijî narkotîkê eşkere kir

**Hêzên Ewlekariya Hundir, madeyên narkotîkê ku di hemleyên xwe yên li dijî sûcan û narkotîkê de desteser kirine, telef kirin. Herwiha ragihandin ku li herêmê 570 kesên di bazirganiya narkotîkê de kar dikirin, girtine.**

Hemwextî Roja Têkoşîna li dijî Narkotîkê ya Cîhanê, Hêzên Ewlekariya Hundirîn civîneke çapemeniyê li dibistana Mîrav a Ajotina Erebeyan ya li bajarê Qamişlo li dar xist.
Nûnerên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Hêzên Ewlekariya Hundirîn tê de beşdar bûn.
Di civînê de berdevkê Rêveberiya Xweser Luqman Ehmê axivî û desntîşan kir ku dewleta Tirk aloziyên li Rojhilata Navîn bi kar tîne da ku êrişên din li dijî herêmê pêk bîne û wiha domand: "Gelek dewletên herêmî hewl didin sûdê ji aloziyên li Rojhilata Navîn bigirin. Ji bo ku hegemoya xwe li herêmê zêde bike û qada dagirkeriya xwe firehtir bike. Mîna dewleta Tirk a dagirker ku hewl dide ji mijulbûna Rûsya û rojava sûd bigire da ku careke din destwerdana herêmê bike."

Her wiha Ehmê teqez kir ku Rêveberiya Xweser li ser hemû astên dîplomatîk û siyasî gelek hewldanan dike da ku rê nede destwerdaneke din a Tirkiyê û wiha domand: "Rêveberiya Xweser beşek ji Sûriyê ye, parastina wê erkê hêzên leşkerî ye di nav de hêzên hikumeta Şamê. Em hewl didin ku hikumeta Şamê berpirsyariyên xwe ji bo parastina hevbeş a sînorên welêt, pêk bîne."
Ehmê balkişand ser bandora narkotîkê li ser civakê û got: "Ciwan, bi rêya wê tên hedefgirtin. Di encamê de civak bi windakirina hêza ciwanan hildiweşe."

### Civakeke bê narkotîk

Paşê cîgirê giştî yê Meclisa Edaleta Civakî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Etiye El-Nime axivî û hewldanên hêzên ewlekariyê, dozgeriya giştî û dîwanên edaleta civakî yên ji bo têkoşîna li dijî narkotîkê silav kir.
El-Nime destnîşan kir ku hêzên ewlekariyê bi hevkariya meclisên edaletê, dozgeriya giştî dîwanên edaleta civakî, hewl dan rê li pêşiya belavbûna vê diyardeyê bigirin da ku civakeke bê narkotîk ava bibe û ji bo ku bikaranînerên narkotîkê careke din tev li civakê bibin, stratjiyek ji bo perwerdekirina wan danî.



Paşê Rêveberiya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundirên Elî El-Hesen daxuyaniya hêzê ya têkildarî vê boneyê xwend.
Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Îro cîhan Roja Têkoşîna li dijî Narkotîkê û bazirganiya ne rewa ya wê pîroz dike. Vê rojê wek boneyekê ji bo xurtkirina xebatan û hevkariyê dibîne da ku cîhanek bê narkotîk ava bibe.
Ev diyarde di serî de ciwanan dike hedef ku sirê dema niha û pêşeroja civakî ne.
Ji bo têkoşîna li dijî narkotîkê divê derfet bên xurtkirin û ev berpirsyarî ne tenê ya hêzên ewlekariyê ye, lê belê erkê hemû sazî, rêxistin û şêniyên herêmê ye.
Narkotîk, sedema sereke ya zêdebûna sûcan e. Cihê tevliheviya civakê ye. Hêzên me her tim li hember bikaranîna wê, bazirganiya wê tê koşiya. Bi hemû hêza xwe bazirganên wê şopand û girtin.
Hêzên me di vê çarçoveyê de gelek hemleyên bi bandor li dijî kesên bazirganiya vê madeyên dikin pêk anîn û madeyên pê re desteser kirin.
Daneyên hemleyên me ji dîroka 26-6-2021`an û heta îro wiha ne:
Barizgariya narkotîk û heşîşê:
Hejmara dosyayên bazirganiya narkotîkê gihaşt 102 dosyayan û di wê çarçoveyê de 203 kes hatin girtin.
Hejmara dosyayên bazirganiya narkotîk û heşîşê gihaşt 113 dosyayan û di wê çarçoveyê de 216 kes hatin girtin.
Dosyayên belavbûna narkotîkê li herêmê:
Hejmara dosyayên vî beşî 259 dosya ye. Di çarçoveya wê de 570 kes hatin girtin ku têkiliyên wan di belavkirinê de hene.
Dosyayên bikaranîna madeyên hişbirê:
Hejamra dosyayên di vî warî de gihaşt 999 dosya. Di wê çarçoveyê de hezar û 410 kes hatin girtin.
Madeyên ku di hemleyan de hatine desteserkirin wiha ne:
Hêzên me 3 milyon û 442 hezar û 30 heb desteser kir.
167 şitlên heşîşê hişk û ernûs, 4 kîlo û 70 gram tovê heşîşê.
8 kîlo û 230 gram madeya krîstal, 127 gram heroîn, 22 gram cocaine.
510 kîlo û 780 gram heşîşê hevir.
Bikaranîna narkotîkê pirsgirêkeke cîhanî ye û divê li ser asta cîhanê hikumet, deste û rêxistin bi hev re kar bikin û girîngiyeke mezin bidin vî warî. Di çarçoveya hewldanên me ji bo pêşxistina kar de, me beşa Têkoşîna li dijî Narkotîkê di nav sazûmaniya giştî ya hêzên xwe de ava kir. Ev beş dê dest bi xebatên xwe ji bo şopandin bazirganên madeyên hişbirê û rêgirtina li pêşiya belavbûna wê di herêmê de me de bike.
Di dawiya civînê de, Beşê Têkoşîna li dijî Sûcên Birêxistinkirî, Têkoşîna li dijî Narkotîkê anku madeyên hişbirê, madeyên hişbirê yên ku hêzên ewlekariyê desteser kirine, telef kirin.
***ANHA***

# Nûrî Mehmûd: Divê civata navneteweyî hevkariya dewleta tirkî ya bi DAIŞ'ê re bibîne

Nûrî Mehmûd hişyarî da ku gefên dewleta Tirkan yên li ser bakur û rojhilatê Sûriyê, DAIŞ`ê vedijîne û got, ya balkêş, di her gefa dewleta Tirkan de tevgera çeteyên DAIŞ'ê zêde dibe. Nûrî Mehmûd teqez kir ku çeteyên DAIŞ'ê ji herêmên dagîrkirî û çolistana Sûriyê derbasî herêmê dibin.

Berdevkê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) Nûrî Mehmûd, têkiliyên di navbera gefên dewleta Tirk û tevgera çeteyên DAIŞ'ê de ji ajansa me re nirxand.
Nûrî Mehmûd diyar kir ku çeteyên DAIŞ'ê li gor AKP'ê ya ku Erdogan serokatiya wê dike tev digere û got: “ Her ku dewleta Tirk gef li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwe, çeteyên DAIŞ'ê tevgera xwe zêde dikin, ev tê wateya ku her du alî heman hişmendî ne lê navên wan cuda.”

Nûrî Mehmûd diyar kir ku dewleta Tirka dagirker ku xwe weke endama NATO'yê dibîne, peyman û qanûnên navneteweyî li gor berjewendiyên xwe bi kar tîne.
Her wiha destnîşan kir ku çeteyên DAIŞ'ê di bin navên cuda de li herêmên di bin dagirkeriya Tirk de tev digerin.

### Stargehên çeteyên DAIŞ'ê

Berdevkê YPG'ê di dewama axaftina xwe de bal kişand ser herêmên ku DAIŞ'ê xwe lê bi rêxistin dike û got: “Çeteyên DAIŞ'ê herêmên di bin dagirkeriya dewleta Tirk de weke stargeh dibînin, di heman demê de li herêma di navbera Dêrezorê, Tedmur û Siweydayê tev digerin”.

Mehmûd destnîşan kir ku li herêmên di bin dagirkeriya Tirk de serçeteyên DAIŞ'ê weke Ebû Bekir El-Bexdadî û Ebû Ibrahîm El-Qureşî hatin kuştin û gelek serçete hatin girtin û wiha domand: “Li herêmên dagirkirî ji bo çeteyên DAIŞ'ê stratejî tê danîn, çete tên perwerdekirin û plan tên amadekirin, êrişa li ser girtîgeha Sînaa ya li bajarê Hesekê jî mînaka wê yekê ye”.

Di 8'ê vê mehê de Yekîneyên taybet ên QSD'ê serçeteyekî DAIŞ'ê ku berpirsê biçekirin û tevlîkirina çeteyan bû li Reqayê girt. Her wiha di 12'ê vê mehê de jî QSD'ê şaneyeke peredayînê ya DAIŞ'ê li bajaroka Holê girtin
Di 27'ê Cotmeha 2019'an de lîderê çeteyên DAIŞ'ê Ebû Bekir El-Bexdadî di operasyoneke hevbeş a QSD'ê û Koalîsyona Navneteweyî li Idlibê hatibû kuştin.

Piştî wê di 3'ê Sibata 2022'an de li gundê Etmê yê li nêzî sînorê Tirkiyê serçete DAIŞ'ê Ebû Ibrahîm El-Qureşî hatibû kuştin.

### ‘Biryargeha wan li Dîlok, Riha û Enqere ye’

DAIŞ û fermandarên DAIŞ'ê li herêmên dagirkirî tên birêxistinkirin û ji wir derbarê herêmên me dibin. Biryargeha fermandariya wan Dîlok, Riha û Enqereyê ne. Sedema derketina çeteyên DAIŞ'ê li herêmên me her du aliyên navborî ne ku me behsa wan kir. Heman demê Erdogan fermandarên çeteyên DAIŞ'ê li herêmên dagirkirî dihewîne. Dema dawî de me dît çawa xwepêşandan li herêmên dagirkirî li dijî desthilata Tirk derketin, daxwaza şêniyên Xûta ew bû ku vegerin warê xwe.”

### ‘DAIŞ bi dawî nebûye’

Nûrî Mehmûd diyar kir ku DAIŞ bi dawî nebûyeû tevgera wê berdewam e û ev tişt anî ziman:” 12 hezar çeteyên DAIŞ'ê di nava girtîgehên me de hene, li kampa Holê jî bi hezaran malbatên DAIŞ'ê hene. Zarokên wan li ber çavê ragihandina cîhanê û civaka navneteweyî li ser heman hişmendiyê mezin dibin. Em dikarin bêjin ku me ew di aliyê erdîngarî de tune kirine, lê hîna me zihniyet û rêxistina wan neqedandine. DAIŞ hîna çalakiyên xwe didomîne. Îhtîmal heye ku şandeyên li herêmên me derekevin, wekî bûyera li girtîgeha Sînaayê ku bi serkêşiya Tirkiyê plana êrişeke dijwar danîbû.”
Di 20'ê Çileya 2022'an de şaneyên DAIŞ'ê êrişî girtîgeha Sînaa ya li taxa Xiwêran a bajarê Hesekê kirin û hewil dan ku 5 hezar çeteyên di girtîgehê de birevînin, lê QSD û Hêzên Ewlekariya Hundirîn di 26'ê heman mehê de dawî li hewildana çeteyan anîn.

### ‘Ji bo dawî li daiş'ê bê divê herêmên dagirkirî bên paqijkirin’

Nûrî Mehmûd teqez kir ku ji bo dawî li çeteyên DAIŞ'ê bê pêwîste herêmên dagirkirî û herêmên di navbera Dêrazor, Tedmur û Siweydayê bên paqijkirin û kar li ser dadgehkirina çeteyan û ji nû ve perwerdekirina zarokên wan bê kirin.

### ‘Gefên dewleta tirk şerê li dijî daiş'ê asteng dike’

Der barê operasyonên li dijî çeteyên DAIŞ'ê jî de berdevkê YPG'ê wiha axivî: “Bê guman hêzên me şerê şaneyên DAIŞ'ê dikin, lê gefên Tirkiyê têkoşîna li dijî DAIŞ'ê asteng kirin. Gefên tên kirin moral didin çeteyên DAIŞ'ê da ku çalakiyên xwe zêde bikin. Lê têkoşîna me dewam e. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji tevahî herêmê ji Dêrazor, Reqa û Minbicê hevkariya hêzên me dikin û di navbera gel û hêzên me de hemahengiyeke xurt heye. Lê gefên dawî yên Tirkiyê dihêle ku şerê me yê li dijî şaneyên DAIŞ'ê bibe asta duyem, ji ber dagirkerî ji DAIŞ'ê xetertir e. Bi vî rengî hêzên me amadekaryiên bersivandina van gefan dikin.”

### ‘Divê cîhan hevkariya dewleta tirk a bi daiş'ê re nas bike’

Berdevkê YPG'ê Nûrî Mehmûd rexne li civata navneteweyî kir ku bi li hember DAIŞ'ê bi erkên xwe ranabin û wiha pê de çû: “Divê cîhan bi giştî hevkariya di navbera dewleta Tirk û DAIŞ'ê de nas bike û tedbîran bigirin. 2 eniyên metirsîdar hene, ya destpêkê dewleta Tirk e ew jî eşkere ye, lê civata navneteweyî bi erkên xwe yên dîrokî li hember terorê ranabin, ya din jî herêmên di navbera Dêrezorê, Tedmur, Siweyda û Derayê de ne ku li wir hêzên rûsî, îranî û hikûmeta Şamê hene, çawa ew tevgera DAIŞ li wan herêman qebûl dikin, divê welatên herêmê van metirsiyan bibînin, DAIŞ ji wan herêman derbasî herêmên me dibin û ji herêmên dagirkirî desteka lojîsîk û teknîkî werdigire.”
Nûrî Mehmûd di dewama axaftina xwe de ev hişyarî da: “Em cîhanê ji metrisiya DAIŞ'ê hişyar dikin û divê dawî li fikir û erdnîgeriya DAIŞ'ê bê kirin. Em derfetên li herêmê hene ji bo çeteyên DAIŞ'ê û malbatên wan bi kar tînin, dewlet bi erkên xwe ranabin, ev barê me giran dike, li kampa Holê zarok li ser îdeolojiya DAIŞ'ê mezin dibin, jin jî parastina wê îdeolojiyê dikin, gelek serçete û emîrên DAIŞ'ê di girtîgehan de hene, ji bo dadgehkirina wan çeteyan me gelek hewildan kirin, ew çete ne tenê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê kiryarên terorî kirine, lê belê li Asya, Ewropa, Amerîka û tevahî cîhanê kriyarên terorî kirine, divê civaka navneteweyî bi erkên xwe rabe”.



### ‘Dadgehên li Rojava bi tenê têr nakin’

Nûrî Mehmûd bal kişand ser girîngiya dadgehkirina çeteyan û got: “Dadgehên li Rojava têr nakin, divê dadgehên navneteweyî bên avakirin, ji ber ku dosya DAIŞ'ê ne tenê girêdayî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, divê lêpirsîn li Tirkiyê û Ewropayê jî bên vekirin ji ber ku têkliyan wan welatan bi DAIŞ û şaneyên wê re hene. Çeteyên DAIŞ'ê nebûna dadgehên navneteweyî derfet digire û tevgera xwe zêde dike û ev yek bêaramî çêdike.”

Berdevkê YPG'ê Nûrî Mehmûd di dawiyê de bang li tevahî cîhanê kir ku metirsiya DAIŞ'ê bibînin û wan dadgeh bikin û ev tişt anî ziman: “Divê cîhan nas bike ku gefên Tirkiyê yên li ser herêmên me çalakiyên DAIŞ'ê zêde dikin û dihêlin ku hîna bêtir xwe bi rêxistin bikin. Ji bo dadgehkirina çeteyan divê cîhan tev bigere, divê dawî li hişmendiya tundrewî bê kirin, her dewletek li gor berjewendiyên xwe tev digere û peymanên navneteweyî bin pê dikin. Divê her deweleke berpirsyartiyên xwe li hemberî gelê xwe bîne û ji bo parastina herêmên xwe biryarên dîrokî bigire.”
***ANHA***

# ’Bêdengiya li hemberî êrişên dewleta tirkî tê wateya hevkariya pê re’

**Jinên bajarê Qamişlo êrişên deweleta tirkî ya dagîrker şermezar kirin û bang li rêxistinên navneteweyî kirin ku li hemberî van sûcan bêdeng nemînin.**

Bi armanca qirkirina gelên herêmê û têkbirina projeya biratiya gelan, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên li ser bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne. Di nava bêdengiya cîhanê de dagîrker û çeteyên wê sûcên li dijî mirovayiyê dikin. Tevî ku Amerîka û Rûsya li hermê gerantor in jî, êrişên dagîrkeran bênavber dewam dikin. Di encamê de gelek welatî jiyana xwe ji dest didin, bi dehan malên wan wêran dibin û aramiya herêmê xerab dibe.
Jinên bajarê Qamişlo êrişên dagîrkeriya tirkî ya şermezar kirin û wek sûcên li dijî mirovayiyê bi nav kirin. Herwiha bang li rêxistinên navneteweyeyî kirin ku li hemberî qirkirinê bêdeng nemînin û diyar kirin ku bêdengî tê wateya hevkariya bi dewleta tirkî ya dagîrker re.
Jina bi nave Nafiya Elî êrişên dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê yên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê şermezar kirin, herwiha diyar kir ku armanca dagîrkeran qirkirina gelê herêmê ye û wiha got: “Dewleta tirkî ya dagîrker hovîtiya xwe ya li dijî gelên herêmê dewam dike. Armanca wê qirkirina gelên resen yên herêmê ye. Tevî ku êrişên wê zagonên navneteweyî û pîvanên mafên mirovan binpê dikin, saziyên pêwendîdar yên Neteweyên Yekbûyî li hemberî kiryarên dagîrkeriyê tev jî xwe bêdeng dikin.”

Nafiya Elî bang li gelên herêmê kir ku yekîtiya xwe bihêztir bikin da planên dagîrkeran bêbandor bikin û axaftina xwe wiha qedand: “Pêwîst e her kes li hemberî planên dagîrkeriya tirkî hişyar be. Em bawer dikin ku wê projeya biratiya gelan bikare dagîrkeran têk bibe. Yekîtya gelên herêmê wê serkeftinê misoger bike.”
Jina ciwan ya bi nave Ahîn Xelîl jî êrişên dagîrkeriya tirkî wek dewama planên parçekirina xaka Sûriyê bi nav kir û wiha axivî: “Dewleta tirkî ya dagîrker bi armanca firehkirina projeya xwe ya dagîrkirinê asta êrişên xwe yên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê zêde dike. Bi van êrişan dixwaze careke din derfetê bide Çeteyên DAIŞ'ê ku li ser xaka Sûriyê bihêz bibin, vê xakê parçe bikin û komkujiyan pêk bînin”



Jina ciwan ya bi navê Sêvîn Elî êrişên dewleta tirkî ya li ser gelên herêmê wek qirkirina mirovayiyê bi nav kir û da zanîn ku ji ber têkçûna dagîrkeriya tirkî li çiyayên Kurdistanê êrişên xwe li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirin û wiha got: “Rojên dawî, dewleta tirkî êrişên xwe li ser herêmê zêde kirine. Ji ber têkçûna wan li Herêmên Prastinê yên Medya, bi awayekî hovane êrişî bakur û rojhilatî Sûriyê dikin. Siyaseta dagîrkeran li tevayiya qadan têk diçe”
Sêvîn Elî bal kişand ser girîngiya rêxistinbûna civakê û axaftina xwe wiha qedand: `Herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê di qonaxeke xeter re derbas dibin. Ji her demê zêdetir pêwîstiya gelên herêmê bi xwerêxistinkirinê heye. Herwiha ji her kesî tê xwestin ku li dora rêveberiya xwe bibin xelek û nirxên hatîn bidestxistin biparêzin.`
***ANHA***



# Kampa Holê bombeyeke li ber teqînê ye

Civat û hêzên navneteweyî hê çareserkirina dosyaya çeteyên DAIŞ'ê yên di girtîgehên Rêveberiya Xweser û malbatên wan yên li Kampa Holê paşguh dikin. Rojbiroj sûcên kuştinê li kampê zêde dibin. Siyasetvan Mihemed Xelf, li ser kombûna çeteyên DAIŞ'ê li cihekî bê ku werin cezakirin şiyarî da.

Kampa Holê 45 km dikeve rojhilatê bajarê Hesekê û ya herî xeter di cîhanê de ye, ji ber ku malbatên çeteyên DAIŞ'ê yên herî tundraw lê hene ku sûcên qetilkirinê û hewldanên reva ji kampê dikin.

Kamp ji 9 beşan pêk tê. Li gorî rêveberiya kampê, di kampê de 56 hezar û 97 kes dijîn, ji wan 29 hezar û 152 kesên iraqî, di nava 7 hezar û 791 malbatî de hene. Her wiha 18 hezar welatiyên sûrî ku ji 4 hezar û 998 malbatan pêk tên hene.
Di beşê 9'an ê taybet bi malbatên DAIŞ'î de 8 hezar û 109 kes hene ku di nava 2 hezar û 416 de malbatan de ne. Ev malbat ji 54 nasnameyên biyanî ne. Her wiha derdora 12 hezar çete di girtîgehên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hene.

Ji destpêka 2022`an ve di Kampa Holê de 24 kes hatine qetilkirin, 13 kes jî birîndar bûne, her wiha zêdetirî 27 hewldanên revê çêbûne.

Li gorî aliyên ewlehiyê yên kampê, zêdetir rewşên kuştinê ji aliyê jinên DAIŞ`î ve têne kirin ku



bi fikrên DAIŞ ê tundraw de ve girêdayî ne. Jinên DAIŞ'î, jinên din tawanbar dikin ku dûrî fikirê wan dikevin û bi rêya dadgehên ku ji aliyê wan ve di hundirê kampê de hatine avakirin têne darizandin. Bi vê yekê parastina fikirên DAIŞ`î yên tundraw dikin.
Pisporên terora navneteweyî hişyarî ji mabûna dosyaya çeteyên DAIŞ'ê bê çareserî da. Her wiha teqez kir ku girtîgeh û kampên ku çeteyên DAIŞ`ê di wan de dijîn dê bibin çavkaniya terorê û dibe êrişên bi armanca revandina wan werin kirin mîna li Afganistan û girîgeha Sînaa ya Hesekê rû dan. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û QSD'ê gelek caran banga çareserkirina vê dosyayê kir da ku xeterî ji holê rabe.

Tevî xeteriya mezin a çeteyên DAIŞ'ê, civata navneteweyî û hêzên cîhanî erkên xwe yên çareserkirina vê dosyayê paşguh dikin, nemaze ya avakirina dadgeheke navneteweyî ji bo darizandina çeteyan.

Siyasetmedar Mihemed Xelef got mabûna dosyayê bêyî ku were çareserkirin xeteriyeke mezin li ser tevahî gelan e û wiha axivî: “Kombûna çeteyên DAIŞ`ê di Kampa Holê de xeteriyeke mezin çêdike. Ji ber ev yek derfetê dide wan ku xwe jinûve bi awayekî mezintirî û li gorî fikrên radîkal birêxistin bikin. Kampa Holê çavkaniya terora cîhanî ye.”

Mihemed Xelef got Kampa Holê mîna bombeyeke li ber teqînê ye, dibe di kîjan kêliyê de biteqe û bi wiha domand: “Em xeteriya DAIŞ`ê baş dizanin. Ji ber em bi vê xeteriyê re li ser rûyê erdê rû bi rû man û me dît”



Xelef destnîşan kir ku êrişa li ser girtîgeha Sînaa ya bajarê Hesekê ya destpêka 2022`an, nîşaneya xeteriya çeteyên DAIŞ`ê û Kampa Holê ye û got êrişa li ser girtîgehê destpêka plana vejandina DAIŞ`ê bû da ku piştî wê Kampa Holê be û ev tişt anî ziman: “Dewleta Tirk dixwaze DAIŞ`ê li herêmê vejîne. Ji ber di asta yekemîn de ew, di serî de serokê wê Erdogan û AKP`ê sûdê jê digrin.”

Mihemed Xelef hişyarî ji bandorên paşguhkirina civak mijara darizandina çeteyên DAIŞ`ê û çareserkirina dosyaya wê ji aliyê civata navneteweyî ve da û wiha axivî: “Hiştina DAIŞ'ê bê darizandin pêşeroja herêmê bi xeteriyeke mezin re rû bi rû dihêle. Ev jî tunekirina DAIŞ`ê careke din zehmet dike.”

Xelef diyar kir ku xeteriya DAIŞ`ê li ser herêmê bi hewldana dewleta Tirk a dagirker ên xurtkirina DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve girêda ku bi vê yekê dixwaze armancên xwe yên avakirina osmaniya nû li ser asteke mezin li Rojhilata Navîn û di bin navê Îsalamê de, pêk bîne.

Mihemed
Xelef bang li civata navneteweyî kir ku erka xwe li hember dosyaya DAIŞ`ê pêk bîne, dadgeheke navneteweyî ji bo darizandina çeteyên DAIŞ'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava bike û got: “Ji ber xeteriya çeteyên DAIŞ'ê di radeya yekemîn de li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, ji ber vê yekê ne mentiqî ye ku DAIŞ'ê li herêmeke din werin darizandin.”
***ANHA***

## Jin û ciwan wê li hemberî dagîrkeriyê pêşengiyê bikin



Zekî BEDRAN

Êrişên Tirkiyê yên ser bakur-rojhilatê Sûriyê didomin. Ango ji dinyayê tevê re ragihand ku amadekariya dagîrkeriyeke nû dike. Pêwîst nabîne amancên xwe jî veşêre. Dibêje ezê ji Til Rifet dest pê bikim, pişt re Minbic, pişt re hinbihin heta Dêrikê bistînim. Seranserê sînorê Sûriyê ji bo xwe kiriye ‘herêmên ewle’. Bi dagîrkirinê tenê nasekine. Li aliyekî jî ji bo ku herêmên weke Efrînê bi ser welatê xwe ve bike amadekariyê dike. L herêmên dagîrkirî xelkê wan derdixe li şûna wan biyaniyan bi cî dike. Ev plana qirkirineke neteweyî ya eşkere ye. Li ser Kurdan plana dewleta tirkî ya qirkirinê ya sedsalan pêk tê. Komar li ser bingehê yek milet, yek dewletê hat avakirin. Ji bo pêkanîna vê jixwe Ermen hatibûn tinekirin. Pişt re Rûm, Asur û Cihû ji Anatolya û Mezopotamya derxistin û di komkujiyan re derbas kirin. Ji sala 1924’an ve jî Kurd ji Tirkan jimartin, hebûna wan hat inkarkirin û li ser wan seferên tinekirinê pêk anîn. Heta roja me ya îro ne plan hatiye guhertin ne jî bişaftin rawestiyaye. Niha jî dixwazin bi serkêşiya faşîstê Erdogan û Bahçelî vê qirkirinê bigihînin encamê.
Ji bo tinekirina Kurdan dewleta tirkî krîza li Sûriyê ji bo xwe kir firset. Lewazbûna Iraqê dîsa biheman armancê bi kar tîne. Bi salan e Iraqû bombebaran dike û li ser erdê wê bi dehan baregehên leşkerî ava kirine. Niha jî ji bo ji bo bikaranîna şerê Ukrayna li hemberî Kurdan bi Amerîka, NATO û Rûsya re di nava bazarê de ye. Serlêdana Swêd û Dînlandiya ya NATO li hemberî Kurdan bi kar tîne. Ji welatên Rojava re dibêje, ‘ezê Kurdan biperçiqînim, êrişên dagîkeriyê bikim hûnê jî erê bikin û piştgiriyê bikin.
Tirkiyê dixwest bikeve Yekîtiya Ewropa. Ji bo endamtiya wê Yekîtiya Ewropa krîter datanîn pêşiyê. Dixwest Tirkiye qanûnên xwe biguherîne û reformên demokratîk bike. Niha tersê wê dibe. Tirkiye ji wan re dibêje, hûnê qanûnên xwe biguherînin û weke min Kurdan qedexe bikin, bigirin û bibin hevparên komkujiyan. Erdogan weke Hîtler vê wêrekiya xwe ya van sepandinên bi ser welatên Ewropa de ji kû digire? Bêguman ev welat ku li nirxên demokratîk xwedî dernakevin û ji her rengê bazarê re vekirî ne, Erdogan wêrekiya xwe ji vê digire û heta dawiyê vê bi kar tîne.
Evên me li jorê gotîn mijarên wisa ne ku hema hema her kes dizane û me gelek caran dubare kirine. Rêveberên Ewropa û Amerîk jî van mijaran pir baş dizanin. Ka Tirkiye çi dike, li dû çi ye Rûsya ji her kesî pirtir dizane. Digel wê berjewendîperestiya wê wisa kir ku Tirkye Sûriyê wêran bike. Tirkiyê ji nakokiyên navber Amerîka û Rûsya sûd girt. Niha jî ji tengavbûna Rûsya sûdê digire û pê re bazarê dike. Biheman rengî NATO û dinyaya Rojava di mijara Swêd û Fînlandiya de dikişîne nava bazarê. Di serê vê bazarê de Kurd hene. Wiha dibêje; Kurdan bidin min, hûn çi tawîzê dixwazin bigirin. Ev bazara bixeter û qirêj êdî li ber çavê dinyayê dibe. Di rewşeke wiha de wê Kurd û gelên Sûriyê çi bikin? Pirsa divê bersiva wê bê dayîn ev e. Dewletên Rojava ku her tim destekê didin Tirkiyê tê zanîn. Wê demê wê helwêst û amadekariya gelên bakur-rojhilatê Sûriyê encamê diyar bike. Tirkiye û dewletên din gelan, guhê xwe nadin berjewendiyên wan û îradeya wan. Derdê wan berjewendî û desthilatdariya wan in. Wê demê divê em ne li bendê bin ku ev dewlet li hemberî dagîrkeriyê helwêsteke cidî nîşan bidin.
Rêveberiyên herêmên xweser û saziyên wan divê her tişta xwe daynin holê û li hemberî dagîrkeriyê amadekariya xwe bikin. Lewra li herêmên dagîrkirî bi dehhezaran bermayiyên DAIŞ'ê û El Nusra dike balaya serê gel. Ne derfetên wan yên jiyanê dimînin ne jî ewleyiya wan. Jixwe li deverên wisa Kurd namînin. Ji bo wan dagîrkirin tê wateya qirkirin û komkujiyan.
Di rêxistinkirina berxwedanê de erkê herî mezin dikeve ser milê ciwanan. Divê ciwan rola xwe ya çalak bilîzin. Divê bizanin ku erkê wa ye ku çandeke şoreşgerî biafirînin û welatperweriyê belav bikin.
Divê ciwan ji kedkaran heta gundewaran bi awayekî berfireh bikevin nava xebat û rêxistinkirinê. Divê di pêşengiya jin û ciwanan de civak tev bê birêxistinkirin û wan tevlî şer bikin. Dema gelekî berxwedêr derkeve meydanê, şansê dagîrkeran namîne. Bi wî awayî wê hem pêşiya dagîrkeriyê bê girtin, hem herêmên dagîrkirî bên paqijkirin. Eşkere ye ku gel vê zordestiyê û dagîrkeriyê qebûl nake û zerereke mezin jê dibîne. Ji bo wê divê jin û ciwan di nava civakê de bi gel re li hemberî dagîrkeriyê li ser erkê xwe bin. Herêmên xweser li Rojhilata Navî herêmên azadiyê ne û modela herî baş e. Ji bo parastina wê divê her kes seferber bibe.